# Belavok ji bo serperiştên guhdanê

## 1. Giştî

Divê tu di çaroveya erkên ku sipartin te alîkariya kesê/kesa pêdivî bi guhdanê bikî daku bikaribe bi karên xwe yên qanûnî rabe, daku ew bikaribe li gorî derfetên xwe jiyana xwe wekî dilê xwe ava bike. Ev tê wê watê, ku peywendiya şexsî, bi taybet axaftina **şexsî** bi kesê/kesa pêdivî bi guhdanê re gelek giring e. Pêkanîna peywendiyên pêwîst bi kesê/kesa pêdivî bi guhdanê re dê ji aliyê Dadgeha Seratayî ji bo karûbarê guhdanê ve werin çavdêrîkirin.

Divê bi giştî daxwazî û hêviyên kesê/kesa pêdivî bi guhdanê werin bicihanîn. Ew daxwaziyên, ku çaverê be, ku dê ziyaneke mezin bigihînin kesê/kesa pêdivî bi guhdanê û nîşanên nexweşiyê bin yan eger bicihanîna wan ji bo te bargiranî be, ne tê de ne. Eger tu nikaribî daxwaziyên kesê/kesa pêdivî bi guhdanê fahm bikî yan eger çênebe, ku tu guhdariya wan daxwaziyên wî/wê bikî, divê tu hingî tê bînî der yan bizanî ka xwesteka wî/wê çi ye, rêzê li xwesteka wî/wê bigirî û xwe bi xwe biriyarê li ser bidî. Eger kesê/kesa pêdivî bi guhdanê wesyetnameyeke nexweşan (Patientenverfügung) nivîsandibe, wê demê divê tu bi hemî hêza xwe û hemî alavên li ber destên xwe, piştevaniya bicihanîna wesyeta kesê/kesa pêdivî bi guhdanê bikî. Divê tu her wiha alîkar bî, daku ew kesê/kesa ji aliyê te ve tê guhdan derfetan bikar bîne, daku dîsa vegere ser hêza xwe ya berê û bikaribe karubarên xwe bi tena serê xwe çêbike yan tu alîkariya wî bikî, daku ew bihêztir bibe.

Ji aliyê qanûnî ve desthilat di destê te de ye, daku tu li beramber dadgehan yan li dervey dadgehan nûneratiya kesê/kesa pêdivî bi guhdanê bikî. Lê dîsa jî desthilata qanûnî ji bo tevgerên qanûnî di destên kesê/kesa pêdivî bi guhdanê de dimîne. Tu tenê hingî dikarî bi karê nûneratiyê rabî, eger ev yek pêdivî bû.

**Tu nikarî nûneratiya** kesê/kesa pêdivî bi guhdanê bikî, eger mijar li ser **peymanên qanûnî** yan li ser **proseyên qanûnî** be,

- ku tu tê de li aliyekî nûneratiya kesê/kesa pêdivî bi guhdanê bikî û li aliyekî din tu nûneratiya xwe bikî yan eger tu mecbûr bî tê de nûneratiya kesekî sêyem bikî yan
- ku tu tê de mecbûr bî nûneratiya kesê/kesa pêdivî bi guhdanê li beramber jina xwe yan mêrê xwe yan hevjîna xwe yan hevjînê xwe yan mirovên xwe yên dereca yekê (wek mîna dapîr û bapîr, dayik û bav û zarok û nevî û nevîçirkan) bikî.

Eger mijarên birêvebirina milk û mal teslîmî te hatibin kirin, wî çaxî divê tu wî milk û malî birêk û pêk birêve bibî û di van mijaran de rêzê li daxwazî û hêviyên kesê/kesa pêdivî bi guhdanê bigirî.

## 2. Destûrpêdanên Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê

Ji bo hemî mijarên ku kesê/kesa pêdivî bi guhdanê ji aliyê qanûnî ve giring bin, pêdiviya te behra bihtir bi destûrpîdanekê ye ji aliyê Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê ve. Ev tê wê watê ku tu bê vê destûrpêdanê nikarî bi rewayî tevbigerî.

Girêbesteke, ku bê destûrpêdana qanûnî ya girêdayî mijarên guhdanê hatibe encamdan, „rawastayî ye û ne rewa ye”. Ew girêbest hingî rewa dibe, dema ku Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê destûra vî karî bi şêweyekî qanûnî bide û ev destûrpêdan ji aliyê din yê

girêbestê re were şandin. Divê tu wergirtina destûrpêdana qanûnî ji aliyê din yê girêbestê re ragehînî.

Li dema girêbestên qanûnî ku ji aliyekî ve têne encamdan (wek mîna betalkirina girêbesta kirêkirina xaniyê kesê/kesa pêdivî bi guhdanê) divê mirov destûrpêdanê **berî** encamdana van girêbestan bîne.

Destûrpêdanên qanûnî yên girêdayî mijarên guhdanê wek nimûne, pêdivî ne ji bo

- **Bicihkirina wî di saziyeke girtî de,**
- Qebûlkirina **tedbîreke tendirustî ya icbarî**
- **Tedbîrên girtinê**, wek nimûne, pêvekirina têlbendekê bi text ve, dana hindek dermanên taybet yan hindek alavên din ku dibin egera girtinê ji bo demeke dirêj,
- **Qebûlkirina pişkinîna rewşa tendirustî, ji bo çûna cihekî tedawîkirinê yan ji bo niştergeriyeke tendirustî ji aliyê doktorekî ve**, eger metirsiyeke ciddî hebe, ku ew kesê/kesa pêdivî bi guhdanê wê ji ber vê tedbîrê bimire yan wê ziyaneke tendirustî ya dijwar û domdirêj were serê wî/wê, helbet ev rêkar jê nagirin, eger mirov bizanibe, ku paşxistina van tedbîran wê ziyanekê bighînin wî/wê kesî/kesê, yan eger tu wek hem serperişt û hem jî doktorên wî/wê heman fikir bin, ku ew rêkar wê li gorî daxwaziya kesê/kesa pêdivî bi guhdanê be, ku wî/wê di wesyetnameyeke nexweşan (§ 1827 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB) de nivîsandiye, yan eger tu wesyetname nebin jî,
- **Neqebûlkirina pişkinîna rewşa tendirustî, ji bo çûna cihekî tedawîkirinê yan ji bo niştergeriyeke tendirustî ji aliyê doktorekî ve**, eger ew tedbîr ji aliyê tendirustî ve beraqil be û metirsiyeke ciddî hebe, ku ew kesê/kesa pêdivî bi guhdanê wê ji ber neçêkirina vê tedbîrê yan ji ber betalkirina vê tedbîrê bimire yan wê ziyaneke tendirustî ya dijwar û domdirêj were serê wî/wê, helbet ev rêkar jê nagirin, eger hem tu wek serperişt û hem jî doktorên wî/wê heman fikir bin, ku ew rêkar wê li gorî daxwaziya kesê/kesa pêdivî bi guhdanê be, ku wî/wê di wesyetnameyeke nexweşan (§ 1827 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB) de nivîsandiye, yan eger tu wesyetname nebin jî,
- **Betalkirina wekaleta pêşlêgir**,
- **Betalkirin û tunekirina girêbesta kirêkirina xaniyekî** ji bo wî xaniyê ku kesê/kesa pêdivî bi guhdanê tê de dijî,
- **Girêdana girêbesteke kirêkirina xaniyekî,** eger pêdivî be, ku tu xaniyekî bidî bi kirê, ku berê kesê/kesa pêdivî bi guhdanê tê dijya, yan girêbesteke din ya kirêkirinê yan damankirinê, eger pêdivî be, ku ew kirêkirin bihtir ji çar salan dewam bike,
- **Girêbestên qanûnî ji bo perçeyek erd,** wek mîna firotina perçeyek erd yan avakirina xaniyek li ser wî erdî,
- **Redkirina standina mîratekê** yan wesyetnameyekê û ji bo girêbesteke li ser mijara mîratê, lê hem li dema hebûna biriyareke kargêrî li ser mîratê yan li ser beşekî mîratê yan beşekî icbarî,
- Standina **qerzekê**
- **Hilgirtina pere,** eger ew pere ne li ba bankekê li ser hisabekî bankê yê bi fayde yê kesê/kesa pêdivî bi guhdanê bin (§ 1848 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB),

- **Dirustkirina lihevkirinê**. Lê helbet eger qîmetê wî tiştê, ku pevçûn li ser tê kirin ji 6.000,00 € kêmtir be, pêdivî bi lihevkirinê nîne. Yan eger dadgehekê ev lihevhatin bi nivîskî pêşniyar yan tomar kiribe.

Ev xalên hatine birêzkirin, **ne temam in**. Eger tu dudilî bî û nizanbî ya rast çi ye, ji kerema xwe pirsê ji Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê bike.

## 3. Erkên giştî li beramber Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê

Li destpêka guhdanê divê **raporteke destpêkê** ji Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê re were şandin. Ne pêdivî ye tu vê raportê bişînî, eger tu wî karê xwe yê guhdanê bi xwebexşî dikî û eger girêdaneke malbatî yan şexsî di navbera te û kesê/kesa pêdivî bi guhdanê de hebe. Lê divê mirov bi kêmanî her sal carekê Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê li ser rewşa şexsî ya kesê/kesa pêdivî bi guhdanê agahdar bike.

Ji bo şîrovekirina peywendiya şexsî bi kesê/kesa pêdivî bi guhdanê re, em hêvî dikin tu bi taybet me li ser van mijaran agahdar bikî,

- çend caran peywendiya şexsî di navbera we de pêk tê,
- bi çi awayî ev peywendiya şexsî pêk tê, û
- eger peywendiyeke şexsî ne mumkin be, sebebên wê yekê çi ne.

Eger mijara guhdana milk û mal jî sipartibin te, divê tu wî çaxî li destpêka guhdanê lîstekê çêbikî û hemî milk û malê kesê/kesa pêdivî bi guhdanê tê de binivîsî (**Lîsteya milk û mal**) û bi belge pêşkêşî Dadgehê bikî (§ 1835 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB). Divê di wê lîsteya milk û mal de her wiha hemî dahat û mesrefên berdewam yên kesê/kesa pêdivî bi guhdanê werin nivîsandin.

Û eger erkê guhdana milk û mal sipartibin te, divê tu wê demê her wiha her sal **hisabê** dahat û mesrefan binivîsî û pêşkêş bikî. Û dema tu vî hisabî çêbikî, divê tu dahat û mesrefan li pey hev birêz bikî û belgeyên li ser wan pêşkêş bikî, eger belgeyên wisa hebin. Divê tu wan belgeyan bi numere bikî û divê mirov karibe di lîsteyê de bibîne ka kîjan dahat yan mesref girêdayî kîjan belgê ne. Eger tu bixwazî, Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê dikare ji bo hêsanîkirina karê te, lîsteyên amadekirî radestî te bike.

Eger tu dayika, bavê, birayê yan xwîşka, jina, yan mêrê, hevjîna yan hevjînê, kesekî ji ziriyeta kesê/kesa pêdivî bi guhdanê bî yan eger tu serperiştekî/serperişteke guhdanê yê/ya girêdayî komeleyekê yan dayreke dewletê bî, wê demê tu bi giştî ji wî erkê pêşkêşkirina hisabê salane efûkirî yî, lê tu erkdar î ji bo radestkirina **lîsteke** salane li ser **mal û milkê** kesê/kesa pêdivî bi guhdanê (§ 1859 bendê 1 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB).

Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê dikare her demeke hebe, hem ji bo demên derbasbûyî jî, daxwaza pêşkêşkirina hisab bike. Ji ber vî hawî, eger tu li destpêkê ji bo pêşkêşkirina hisab hatibî efûkirin jî, wê baştir be, ku tu dîsa hemî belgên hisabê bankê li ba xwe hilgirî.

Divê tu li gorî madeyên qanûnî §§ 1831 - 1833, 1864 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB) **yekser** ji Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê re ragehînî, eger

- rewşa şexsî û aborî ya kesê/kesa pêdivî bi guhdanê bi şêweyekî mezin hate guhertin,

- rakirin yan sînordarkirina guhdanê mumkin be yan eger berferehkirina karê guhdanê pêwîst be,
- biriyardana mercekî qebûlkirinê (anku kesê/kesa pêdivî bi guhdanê ji bo daxuyanîkirina daxwaza xwe pêdivî bi qebûlkirina te ya aşkere ye) pêwîst be yan eger betalkirina wî mumkin be,
- mecbûr be, ku serperiştekî/serperişteke din destnîşan bikin,
- betalkirina bicihkirina di cihekî girtî de yan betalkirina tedbîreke girtinê mumkin be yan eger ev tişt bê zanebûna Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê hatibe bidawî kirin,
- te qebûlkirina xwe li ser çêkirina tedbîreke tendirustî ya icbarî betal kiribe, yan
- navnîşana te yan ya kesê/kesa pêdivî bi guhdanê hatibe guhertin.

## 4. Heqdest, bedelekî mesrefan û lêvegerandina mesrefan

Guhdan bi giştî bê pere tê encamdan (§ 1876 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB). Lê Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê dikare heqdestê te yan maaşekî bide te, eger kesê/kesa pêdivî bi guhdanê zengîn be û dana vî maaşî ji ber karê te yan zehmetî û dijwariya bicihanîna karûbarên wî/wê ji te re heq be.

Eger tu mecbûr mayî li dema karê xwe **mesrefê** ji berîka xwe bikî, wê demê eger tu berî hingî bi Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê re biaxivî, tu dikarî wan pereyên te ji ba xwe dane ji malê kesê/kesa pêdivî bi guhdanê bibî. Û eger tu malê wî/wê nebe, wê demê tu dikarî daxwaznameyekê pêşkêş bikî û Dadgehê dê hingî wan pere ji xezîneya Herêmê bide te.

Tu dikarî li şûna daxwazkirina bedelê mesrefên te bi rastî kirine, her wiha daxwaza standina **perekî vebirî** bikî. Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê dikare ji te re bêje, ka bilindiya van pereyên vebirî çend e. Dadgeh dikare cara pêşî van pereyên vebirî piştî derbasbûna salekê ji destnîşankirina serperiştiyê bide û piştî hingî her sal bide (§ 1878 bendê 3 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB).

Ev heqê te dişewite, eger tu heta **30.06. ji sala di pey re** daxwaza van pereyan nekî.

## 5. Agahdariyên din, şêwirdarî û alîkarî

Dadgeha Seratayî ya karûbarê guhdanê û – eger tu bixwazî – dayra karûbarê guhdanê jî dikarin li dema karê te yê guhdanê şîretan li te bikin û alîkariya te bikin. Tu dikarî daxwaza belavokeke agahdariyan ya bê pere li ser mafê guhdanê ji ofîsa şandina belavokan ya Hukumeta Federal bikî.